# Ronahî

Şopdara Rastiyê ye

Rojnameya siyasî, civakî û çandî | Jimar :1064 | 14-Gulan- 2023 | www.ronahi.net/ku/



Navnîşan

www.ronahi.net/ku/ nameronahi@gmail.com ☎ 423165


## Qudreta alavên zêr û zîvîn

**Hin alav an jî bermahiyên dîrokî dikarin derbarê serdemekê de gelek tiştan zelal bikin. Alavên zêr û zîvîn ên Persan jî derbarê deshilatdariya wan de gelek tiştan rave dikin. Her wiha qudreta van alavên zêr û zîvîn nîşan dide bê ka wan çawa li ser xelkê din jî tesîr ava kiriye. Nexwasim jî Yewnanan, piştî ku Pers têk birin, qir û qaf û alavên zêr û zîvîn ên Persan teqlîd kirin û ji sinhetkariya wan sûd wergirtin.**

Di navbera leşkerên Yewnan û Persan de Beriya Mîladê di navbera salên 499-449’an de şerê “Greko-Pers” çêbûn. Dema leşkerên Yewnan li meydana şer berê xwe didin çadirên



deshilatdariya Persan ku ew ji wir şer birêve dibin, di çadiran de çav bi alavên ji zêr û gelek luks dikevin. Tiştên ku di van çadiran de dibînin hêz, qudret û ezameta desthilatdariya Persan e. Lê di heman demê de ev alavên luks in ku dawî li desthilatdariya Persan tînin, ji lewma her ku desthilatdariya Persan fireh û mezin bûbû, xemla ji bo nêşandana dewlemendiyê jî zêde bûbû û vê yekê kiribû ku dsîplîna wan ji holê rabe û bi vî awayî leşkerên Persan têk çûn li hember leşkerên Yewnanî. Yanî malê dinyayê, xemla zêde û luksbûnê, civaka Persan pûç kiribû ji lewma jî dema leşkerên Yewnan êriş birin ser wan, ew têk çûn. Ji ber ku li hemberî wan artêşeke Yewnan a bi dsîplîntir hebû û Yewnan bi saya vê dsîplînê bi ser ketin.

Jixwe, hin nivîskarên Yewnanî jî wiha dinivîsîn; “Xezîneyên mezin hebûn di van çadiran de. Mobîlya û alavên zêr û zîvîn… qedehên ji zêr û tasên zîvîn…” Ev alavên zêr û zîvîn ne alavên ji rezê bûn, wan alavan di heman demê de îşaret bi otorîte û hêza deshilatdariya Axamenîş jî dikir. Lê herî dawî bi êrişa Skenderê Mezin otorîteya Persan hilweşiya û ev alavên luks ketin destê Yewnanan. Jixwe, bi vî awayî serdema Helenîstîk ya ku çandên Rojhilatî û Rojavayî bi hev ve girê dide, dest pê dike. Bi demê re jî ti bandora çanda Persan namîne û Yewnan gelek çandên Rojhilatî dikin malê xwe û li ser mîrasa Persan şaristaniyekê ava dikin. Ev alavên ku niha li muze û pêşangehan tên nîşandan jî vê yekê nîşan didin û derbarê dîrokê de gelek tiştan tînin ziman.

### Îşaret bi otorîteyê dikin

Qismek ji van alavên hanê, niha li “British Museum” tên nîşandan. Gelek ji wan jî paşê hatine çêkirin û çanda Persan teqlîd dikin. Ev alav her çiqasî weke nîşaneya luksê werin dîtin û dawî li desthilatdariya Persan anîbin jî, di heman demê de xweşikiya van alavan serdema Pers, Yewnan û Helenîstîk ronî dikin; niha jî Asya û Ewrûpayê li ser mîrateya vê luksê hebûna xwe ava dikin û pê dijîn. Yanî ev tenê xweşikiya çend alavên ji zêr û zîv nîne, hêz û otorîteyeke çandî ye jî. Mirov dikare wan weke nîşaneyên siyasî jî binirxîne, ji lewre di warê civakî û polîtîk de jî bandora van alavan çêbûye. Nexasim jî çanda Helenîstîk a ku piştî dagirkirinên Skenderê Mezin ava bûye, hîmê xwe li ser vê çandê danî û paşê jî bi deshilatdariya Romayê dewam kir. Yewnanan hîna di wî çaxî de rojhilatî weke barbaran bi nav dikirin lê ji bo alavên ji zêr û zîv jî dimirin! Wan çanda Yewnanî bi saya van alavên ku “barbar”an çêkiribû, dewlemendtir kir û niha jî neviyên wan bi saya vê çandê li ser piyan in.

### Sinehetkariya Persan

Yek ji van alavan “Rhyton” a zîvîn a bi stêrk e. Rhyton ji wan alavan e ku ji qiloçên heywanan dihatin çêkirin. Ev alav, weke tasekê di ayînên olî de û her wiha ji bo vexwarina şerabê dihatin bikaranîn. Dev, per û qiloçên zêr ên “rhyton” ku di dema Persan de hatiye çêkirin, nîşaneyeke xurt a sinehetkariya Persan e. Sinehetkarên Yewnanî, nexasim dilê xwe dibijandin van alavan û dixwestin eynî ji van alavan çêkin û wan bi kar bînin. Ev “rhyton” di heman demê de yek ji nîşaneyên dewlemendiya serayên Persan bû.
Her wiha sîwanên tavê yên li ser qir û qafan jî dîsa îşaret bi desthilatdariya Persan dikin. Sîwanên li ser van qir û qafan îkonên deshilatdariya Persan bûn. Lê piştî ku Yewnanan ev tişt girtin cem xwe, bi demê re van sîwanan tenê jin temsîl kirin û bi jinan re hatin bibîranîn. Nexasim jî di teswîrên bêhnvedana jinan de em van sîwanan dibînin. **Ozgur Politika**

## Fînala Festîvala Çanda Kurd a Parîsê hat lidarxistin

**Fînala Festîvala 2’yemîn a Çanda Kurd a Parîsê li Salle Gaveau bi stranên Bajar, Mehmet Atli û Rûşen Yilmaz pêk hat.**



Li Parîsê bi hevkariya Konseya Demokratîk a Kurd a Fransa (CDK-F), Enstîtuya Raman û Lêkolînê ya li ser Kurdistanê (IREK), Komeleya Çand û Hunerê ya Kurdistanê (ACK) û Weqfa Danielle Mitterrand a Parîs û piştgiriya 10’emîn Şaredariyên Parîs, Bobigny û Sarcelles fînala Festîvala Çanda Kurd a Parîsê pêk hat. Kurdistaniyên li Parîsê dijîn û yên li ser çanda Kurdî meraq dikin, di hefteya dawî de bi konser, pêşangeh, şano û çalakiyên cuda yên çandî hatin cem hev. Konsera fînalê ya festîvalê ku diyariya Evîn Goyî, Mîr Perwer û Abdurrahman Kizil ên li Parîsê hatin qetilkirin hate kirin, bi stranên Rûken Yilmaz dest pê kir.
Di roja dawî ya Festîvala Çanda Kurdî ya Parîsê de hunermendên Kurd ên naskirî û navdar ên ji kevneşopiyên cuda yên muzîkê hatin cem hev.
Koma Bajar bi stranên bêhempa ya kevneşopiyên muzîka Rojhilata Navîn, muzîka gelêrî û muzîka rock pêşkêş kir.
Di fînala konserê de Mehmet Atli derket ser dikê. Hunermendê ku di salên 1990’î de bi koma “Koma Dengê Azadî” dest bi karê muzîkê kir, berhemên hostayên kevneşopiya muzîka Kurdî pêşkêş kir.
Xebatkarên festîvalê ku heta derengiya şevê dom kir, dema derketin ser dikê careke din Evîn Goyî, Mîr Perwer û Abdurrahman Kizil bibîr anîn gotin “Li cihê ku em tên qetilkirin, em zêde dibin”
Konser bi dirûşmeyên “Jin jiyan azadî” û “Şehîd namirin” bi dawî bû.
**ANFNEWS**

### Sudoku: Bersiv 73

| | | | | | | | | |
|---|---|---|---|---|---|---|---|---|
| 4 | 8 | 5 | 3 | 1 | 9 | 2 | 6 | 7 |
| 2 | 9 | 3 | 7 | 5 | 6 | 1 | 8 | 4 |
| 1 | 6 | 7 | 8 | 2 | 4 | 3 | 9 | 5 |
| 9 | 4 | 8 | 2 | 6 | 7 | 5 | 1 | 3 |
| 3 | 1 | 2 | 5 | 9 | 8 | 7 | 4 | 6 |
| 5 | 7 | 6 | 1 | 4 | 3 | 9 | 2 | 8 |
| 7 | 3 | 4 | 9 | 8 | 2 | 6 | 5 | 1 |
| 6 | 5 | 9 | 4 | 7 | 1 | 8 | 3 | 2 |
| 8 | 2 | 1 | 6 | 3 | 5 | 4 | 7 | 9 |

### Sudoku:Pirs 74

| | | | | | | | | |
|---|---|---|---|---|---|---|---|---|
| 6 | 3 | | | 7 | 4 | | 9 | |
| 8 | | | | | | | 5 | |
| | | 4 | | | 2 | 7 | 1 | |
| | | 5 | | | | | 4 | |
| 1 | | | 8 | 5 | 7 | | | 6 |
| | 9 | | | | | 5 | | |
| | 6 | 8 | 2 | | | 4 | | |
| | 1 | | | | | | | 5 |
| | 7 | | 3 | 4 | | | 8 | 1 |

### Quncika Têgînan

| | |
|---|---|
| **Biryar** | **Li ser kirina tiştekî yan awayê kirinê bijartin, ferman, yan li hevkirin. Qerar** |
| **Biryardarî** | Israr, israra di biryarê de |
| **Erk** | Tişta ku divê kesek bike. Wezîfe, peywir: Parastina welat erkê me tevan e. |
| **Erkdar** | Kesê bi karekî hatî wezîfedarkirin. Wezîfedar. |
| **Maf** | Tişta ku qanûn yan jî çanda civakekê rê didinê ku bê kirin. Heq: Azadî mafê her kesî ye. |
| **Mafdar** | Kesê ku mafê kirina tiştekî jê re heye. Xwedîheq: Ez di gotina xwe de mafdar im. |
| **Polîtîka** (Îtalî) | Diyarkirina pirsgirêkan û çareserkirina wan. Siyaset |
| **Rewşenbîr** | Kesê di mijara çand û civakî de jîr, zana û têgihiştî. Ronakbîr, entelektûel |
| **Sîvîl** (Fransî) | Kesê ne leşker. Medenî |
| **Wane** | Demek ya fêrbûnê. Ders |


# Ronahî

Şopdara Rastiyê ye

Rojnameya siyasî, civakî û çandî | Jimar : 1064 | 14-Gulan- 2023 | www.ronahi.net/ku/




Xebatên mirovî yên Heyva Sor A Kurd R-6

## 14’ê Gulanê Wê Bi Dengê Azadiyê Bê Xemlandin



Di 14’ê Gulanê de wê li bakurê Kurdistanê û seranserî Tirkiyê hilbijartinên perlemento û serokkomariyê dest pê bikin, derbarê hilbijartinan de, siyasetmedarên bakur û rojhilatê Sûriyê bang li gelên azadîxwaz yên li bakurê Kurdistanê û Tirkiyê kirin ku li dengê xwe xwedî derkevin û faşîzma AKP-MHP’ê ji holê rakin.R-4

## Hebûna zimanê kurdî hebûna gelê kurd e



Bi boneya Roja zimanê kurdî rewşenbîr, mamoste û xebatkarên zimanê kurdî li Rojavayê Kurdistanê Roja Zimanê Kurdî pîroz kirin û ast, pêşveçûn û destkeftiyên zimanê kurdî ku di encama şoreşa Rojava de hatine bidestxistin, dan diyarkirin.R-7

# 2’ YEMÎN MIHRÎCANA MÛZÎKÊ YA ORKÊŞ DENG Û RENGÊ GELAN E

Bi beşdariyeke mezin a şêniyan û bi tevlêbûna 30 komên ji Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê, bi dirûşma “Bi dengên pîroz şoreş ava dibin” 2`yemîn Mîhrîcana Mûzîk û Stranan a Orkêş li Navenda Çand û Hunerê ya Mihemed Şêxo ya bajarê Qamişlo dewam dike.R-3




## ‘Dîrok û xebata jina kurd mijara berhema nû ya Hunergeha Welat e’

Endamê Istodoya Hunergeha Welat Bêkes Darî, berhema xwe ya nû û rengîn ya di derbarê jina kurd de, ku wê di dema pêş de were amadekirin, eşkere kir. R-2






Îro Deriyekî Dojehê Tê Girtin

Idrîs Henan R-5

## Azadiya fîzîkî ya Ocalan çareserî ye



Endamên Delegasyona Aştiyê ya Îmraliyê ya Navneteweyî çûn serdana Buroya Hiqûqê ya Sedsalê û têkildarî tecrîdê agahî wergirtin. Wan got, bi azadiya fizîkî ya Abdullah Ocalan, pirsgirêka Kurd dikare bê çareserkirin.R-3

# “Kooperatîf di kêmkirina bandorên krîza aborî de girîng e”

## Rêvebera Komîteya Aboriya Jin a Kongra Star a Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê Gulê Mûrad girîngiya kooperatîfan di rewşeke ku ambargo li ser herêmê tê ferzkirin, şert û mercên şer de heye nirxand.

**RONÎDA HACÎ**

Hesekê – Kooperatîf mirovan bi rengek demokratîk û wekhev tînin cem hev. Çi endam xerîdar, karmend, bikarhêner, an niştecih bin, kooperatîf bi rêbaza demokratîk ‘yek endam, yek deng’ bi rê ve dibin. Li Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê jî bi sedan kooperatîfên giştî û yên girêdayî Komîteya Aboriya Jin a Kongra Star hene. Ev kooperatîf derfetên kar û peydakirina pêdiviyên jiyanê ji gelek jinan re vekir û jinan di kooperatîfan de hunera xwe pê re bi civakê re parve kirin.

Li Sûriyeyê ji ber zagona Qeyserê û ambargoya heyî li ser Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê û giştî welat krîzeke aborî heye û civak jê bêzar bûne. Têkildarî vê mijarê Rêvebera Komîteya Aboriya Jin a Kongra Star a Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê Gulê Mûrad axivî.

### ‘Bi kooperatîfan re têkiliyên jinan xurtir dibin’

Gulê Mûrad got ku axa wan a dewlemend heye ku mirov xwedî lê derkevin, wê pir sûd jê bigrin û wiha domand: “Projeyên me yên herî pêşketî yê li Herêma Cizîrê ne û bi taybet yê çandiniyê ye. Ev erdên di destên me de, me kirin xizmeta kooperatîfên jinan. Li gorî rûbara erd, hêjmara jinên ê ku wê di kooperatîfê de cih bigre tê diyarkirin. Mînak hin kooperatîfên biçûk hene tenê çar jin di nav de cih digrin û kooperatîfên mezin jî dighêje 40 jinan. Di van kooperatîfan de têkiliyên jinan û yê civakî yê ku di navbera qutbûyînê de bû, ji nû ve pêşketin. Têkiliyên di navbera jinan de xurtir bûn, bêtir hev û hêza hevdû naskirin. Her wiha di koopertîfan de jinan xizmên xwe na skirin. Kooperatîf bûbû cihê naskirin û xurtkirina têkiliyan.”

### ‘Krîza aborî siviktir dike’

Gulê Mûrad da zanîn ku li welat şer dest pê kiriye ji lewre ji jinan hat xwestin ku hevgirtina xwe çêbikin û berê xwe dan kooperatîfan û wiha pêl da gotinên xwe: “Li welat şer dest pê kiribû, dema ku jin bi tenê



jî man negotin em nikarin û nakin! Lê belê, kirasê xwe hilmaland û got; ez ê bikim. Ji lewre xwe spartin kooperatîfên jinan ku sûdê hem dide wê, ku zanista xwe bi derdorê re parve bike û ji bo aboriya wê ya zeyîf dibû destek û derfeteke jiyanê bû. Em nikarin bêjin ku krîza aborî bi kooperatîfan tê çareserkirin lê tê sivikkirin. Girêdana bi ax û welat re zêdetir çêbû, kêfxweşiya jinan mezintir bû. Di demek de ku gelek jin li malê bûn nizanibûn çi bikin, kooperatîf bû derfeteke jiyanê ya nû ji wan re.”

### Sedemên avanekirina kooperatîfên mezin

Gulê Mûrad bal kişand ser derfetên komîteyê di avakirina kooperatîfên mezin de û ev tişt anî ziman: “Wekî komîte derfet û îmkanên me yên zêde tune ye ku em kooperatîfên mezin ava bikin. Ji lewre berhemên ku ji projeyên biçûk tên, em hewl didin pê kooperatîfên mezin ava bikin. Em dixwazin ku kargehên mezin û kampanyanan ava bikin lê belê xwestek tenê têrê nake divê ku derfetên wê jî werin peydakirin û ev jî niha zehmet dibe li gorî rewşa herêmê. Xewn û xeyala me ew e ku jinek bi tenê jî ji derveyî kooperatîfên me nemîne, yan jî destên xwe li



ber mêr veneke. Şert û mercên herêma me jî bandorê dike, ji ber hişkesaliya heyî û şerê bênavber ku her em pê re rû bi rû dimînin. Her wiha ambargoya li ser herêmê tê ferzkirin, bilindbûna nirxê dolar, lîstikên bazirganan û gelek sedemên din jî hene.”

### ‘Bi pêşxistina bikaranîna enerjiya rojê em ê aboriyeke ekolojîk ava bikin’

Gulê Mûrad da payin ku ji bo ekolojiyeke paqij ava bikin, wê berê xwe bidin bikaranîna enerjiya rojê û wiha pêl da gotina xwe: “Projeyên me yên demê pêş hene, em hewl didin enerjiya rojê ji bo projeyên çandiniyê, pîşeyî û bazirganî bi kar bînin. Em wekî aboriya jin a Kongra Star, aboriyeke ekolojîk in û naxwazin zirar bigihîje derdorê. Bi bikaranîna enerjiya rojê re pirsgirêkên elektrîk, jenerator, mazot, dûmana wê ya qirêj ku zirarê dide tên çareserkirin. Di vê salê de li herêma Cizîrê zêdetirî 4 hezar dar hatin çandin, kêm e û em hewl didin hîn bêtir çandina daran zêde bikin. Li Reqa,Tebqa, Dêrazor û Minbicê jî 7 hezar dar hene lê îsal jî me 4 hezar û 500 jî lê çandin. Em hewl didin projeyên çandiniyê jî bi pêş bixin. Di heman demê de em hewl didin hin projeyên heyî bikin sîstema kooperatîfan.”

### ‘Aboriya jinan a xweser nebe, azadiya xwe ji dest dide’

Gulê Mûrad da xuyakirin ku dema aboriya jin nebe, azadiya xwe ji dest dide û wiha dirêjî da gotinên xwe: “Girêdaneke ne normal di navbera azadiya jin û aboriya jin de heye, dema ku aboriya jin ne serbixwe be, pê re azadiya xwe jî ji dest dide. Em ji krîzê re heya astekê dibin bersiv, mînak dema ku em li erdên xwe genim diçînin li herêmên me dimîne û dikeve sewamê me de. Bi wî genimî, em projeyên tenûran bi pêş dixin û pêwîstiyên jin û civakê bi cih tînin. Hemû berhemên ji kooperatîfên çandiniyê û tenûran tê, sûdê li civakê dike.”

### ‘Îsal jin gelek kêfxweş in’

Gulê Mûrad bi vê gotinê dawî li axaftina xwe anî: “Kedkarên vê axê, vê doz û welatî hêja ne ku mirov her dem wan bi bîr bîne û keda wan, xwêdana ku didin pîroz bibîne. Dawiya meha Gulanê de, em dest bi çinîna genim dikin. Ji niha de jin bi kelecan in û cotkar patos û traktorê xwe amade dikin. Em ji niha ve wê kelecana wan silav dikin û hêvî dikin ku hemû jin bi vê kêfxweşiyê biçin ser erdên xwe.”

**JINHA**

# ‘Dîrok û xebata jina kurd mijara berhema nû ya Hunergeha Welat e’

**Navenda nûçeyan**

**Endamê Istodoya Hunergeha Welat Bêkes Darî, berhema xwe ya nû û rengîn ya di derbarê jina kurd de, ku wê di dema pêş de were amadekirin, eşkere kir.**

Di herikandina dîroka jinê de ya berî hezarên salan, jinên xwedawend mîna Xwedawend Înana, Eştar û hwd. Dîrok xêzkirin û kedeke wan ya mezin di pêşxistina dîrokê de hebû. Herwiha jin bû dayîk û hevjîneke xwedî nirxeke pir bilind, lê hember vê yekê jî gelek zor û zilm xwariye. Her weha bi berxwedana xwe bûye wêjenas, dîroknas, siyasetmedar û hwd… Di gelek beşên jiyanê de bi erkên xwe radibe, bûye şervan û fermandar û li hemberî dijmin û deshilatdaran şer dike û bi fikir û ramanên feylesûfên weke Rêberê




kurd Abdullah Ocalan civaka xwe parastiye û azad kiriye.

Hêjayî gotinê ye ku jina kurd li gor van destkeftiyan mînakeke berz e, bi taybet li Rojavayê kurdistan û Sûriyê, bi çirûska agirê Şoreşa 19’ê Tîrmehê ku roleke ber bi çav û guhêrbar di hemû warên jiyanê de lîst.

Her wiha Hunergeha Welat jî dest bi pirojeyeke hunerî di derbarê dîroka jinê û bi taybet jî rola jina kurd, ya di pêşveçûna Şoreşa 19’ê Tîrmehê de; wê hunergeha welat bi rengekî nû kilîpeke giranbuha amedebike.

Di derbarê vê berhema ku wê di dema were de endamê Istodiyoya Hunergeha Welat Bêkes Darî ji rojnameya me re axivî.

### ‘Hunergeha welat, dîrok, ked û xabata jina kurd bi berhemeke nû vedibêje’

Bêkes Darî da xuyakirin ku berhema Hunergeha Şehîd Welat ya ku wê di pêşerojê de derkeve di derbarê dîrok û rola jina kurd di Şoreşa Rojava de ye û wiha got:” Kar û xebata ku em di Hunergehê de didin meşandin bê navber e. Her wiha em ê, di demên pêş de dest bi karekî hunerî yê nû bikin, ev kar jî bi taybet girêdayî jin û dîroka ya ji dema xwedavendiyê destpê dike û heta roja îro. Her wiha ku çawa ku bi dirêjiya demê re bû mamost, siyasetmedar û bi taybet rola jina Rojavayê Kurdistanê di pêşveçûna Şoreşa 19`ê Tîrmehê de, wê mijara vê berhemê be. Hêjayî gotinê ye ku ji niha ve Hunergeha Welat bi hemû endam û xebatkarên xwe karê derhênerî û sênariyoya vê berhemê dikin û amadekariyê muzîk, awaz û helbesta vê berhemê tê kirin. Her wiha ev berhem jî pir dirêj e ku ji 7 beşan pêk tê û nêzî 400 jinî wê cihê xwe di nav vê de bigirin. Cihê serfiraziyê ye ku ji bo jinên Rojavayê Kurdistanê ku wê Komîte li Şehbayê, Kobanê û herêma Cizîrê jî bêne çêkirin. 100 jinên bi cil û bergên Efrînê, 100 jin bi cil û bergên Kobanê, 100 jinên din bi cil û bergên Cizîrê û 100 jî bi cil û bergên leşkerî yên YPJ`ê û Gerîla jî cihê xwe di kilîbê de bigirin.”



# Hebûna zimanê kurdî hebûna gelê kurd e

## Bi boneya Roja zimanê kurdî rewşenbîr, mamoste û xebatkarên zimanê kurdî li Rojavayê Kurdistanê Roja Zimanê Kurdî pîroz kirin û ast, pêşveçûn û destkeftiyên zimanê kurdî ku di encama şoreşa Rojava de hatine bidestxistin, dan diyarkirin.

Di her civakekê de navgînek ji bo danûstandinê heye ku ev navgîna zêrîn jî ziman e. Hebûna ziman ji bo her civakekê hebûn û nasnameya wê civakê ye. Zimanê kurdî jî, ji destpêka şoreşa 19`ê Tîrmeh ve, heta roja îro gelek gavên mezin avêtine, di şoreşê de û di encama kar, xebat û kedeke bêhempa de, hîmên bingehîn ên parastin û pêşxistina zimanê kurdî hatin danîn, êdî minhac û rêbazên bi zimanê kurdî hatin amadekirin û zimanê kurdî di hemû qonaxên perwerdeyê de tê fêrkirin û xwendin. Di encama salên dirêj de bi sedan mamosteyên zimanê kurdî hatin amadekirin, herweha bi hezaran kes fêrî xwendin û nivîsandina bi zimanê kurdî bûn. Di heman demê de niha bi sedhezaran xwendekar li dibistan, peymangeh û zanîngehan perwerdeya xwe bi zimanê kurdî dibînin. Girêdayî saziya zimanê kurdî navendên pêşxistin û serrastkirina şaştiyên zimanî pêş ket.

Di milê weşangeriya kurdî de jî gavên balkêş têne avêtin, bi sedan pirtûkên kurdî hatin çapkirin, gelek kovar û rojname derketin. Herwisa navend û saziyên wergerê pêşketin û pirtûkan ji zimanê curbecur werdigerînin kurdî, ev jî bêguman di pêşxistina ziman de roleke girîng dilîz e. Dîwanê wêjeyê hate avkirin ku wê ji bo pêşxistina wêjeya kurdî û nivîskariya bi zimanê kurdî roleke baş bilîze û bi vê armancê gelek çalakiyan li dar dixe mîna mehrecan, pêşbirk û hefteyên wêjeyî. Di heman çarçoveyê de Mastera ziman û wêjeya kurdî li zanîngeha Kobaniyê di sala 2022`an de hate destpêkirin, ku niha nêzî 20 mamosteyan jî Zanîngeha Rojava û Zanîngeha Kobanê û Saziya Zimanê Kurdî tevlî bûne.



### ‘Zanîngeha Rojava berhemeke ji berhemên Şoreşa 19`ê Tîrmehê ye’






Endamê Desteya Rêveber ya zanîngeha Rojava Aram Hesen da zanîn Ku Zanîngeha Rojava ew jî berhemek ji berhemên şoreşa 19`ê Tîrmehê ye, û wiha got: “ Zanîngeha Rojava ku ew jî berhemek ji berhemên şoreşa 19ê tîrmehê ye, û damezrandina wê pêwîstiyek bû ji ber ku di qonaxên beriya zanîngehê de perwerde dibû kurdî û divya bû ku zanîngeh bêne vekirin, da ku xwedekarên derçûyên dibistanên Rêveberiya Xweser karibin xwendina xwe ya bilind bidomînin. Lê ji ber şert û mercên Rojava û kêmpeydabûna akademîsyen û pisporên ku karibin di beşên curbecur ên zanîngehê de bi kurdî weneyan bidin û ji ber ku piraniya zêde ya mamosteyên ku tevlî zanîngehê bûn xwendin û nivîsandina wan a kurdî tune bû yan jî kêm bû, lewma perwerde û bi taybetî semînerên nivîskî bi erebî bûn. Tevî ku nasnameya zanîngeha Rojava kurdî ye û zimanê perwerdeyê yê fermî jî kurdî ye, lê tenê li beşa ziman û wêjeya kurdî perwerde sirf kurdî ye, û mataryalên giştî mîna dîrok, neteweya demokratîk û jineolojî bi kurdî têne dan, her wiha di hin beşan de hin materyal bi kurdî têne dan. Ji ber di salên detspêkê yên damezrandina zanîngehê de hîn derçûyên dibistanên Rêveberiya Xweser çênebûbûn, lewma pirsgirêka perwerdeya bi zimanê erebî nebû. Lê zanîngeh ji vê haydar bû û dizanîbûn ku pêwîst e ji bo bichkirina zimanê kurdî û kurdîkirina perwerdeyê li zanîngahê hewlên cidî bêne dan, li ser vî bingehî, li Zanîngeha Rojava navenda amadekirina çavkaniyên zanîngehê di 10’ê Sibata 2020’an de hat damezrandin. Di nava (navenda amadekirina çavkaniyên zanîngehê) de xebatên ku hatin kirin: Avakirina komîteyên amedekirin û wergerandina pirtûkan. Di vê çarçoveyê de ji bo beşên zanistî yên sereke pêwîstiya ferhengên têgînan derket û li gor wê biryara amedekirina ferhengên têgînan hate girtin. Bi vî awayî wê kar dest pê bikira, lê ji ber pandemiya Koronayê di 15 Adara 2020’an de karantîna dest pê kir. Ji bo wê jî ev xebat bi encam nebû.”

Endamê Desteya Rêveber ya zanîngeha Rojava Aram Hesen axaftina xwe wiha bi dawî kir: “Piştî Koronayê hin xebat hatin kirin lê ji ber ne di asta pêwîst de bûn nehatin erêkirin. Sedemên vê yekê jî pir bûn; pisporên ku bi kurdî materyalan binivîsin ( bi taybet di beşên zanistên xwezayî de) tune bûn, lewma pilan hate danîn ku ji bo her materyalekê pisporekî zimanê kurdî û pisporekî materyalê bi hev re bixebitin, lê wê jî encam neda ji ber ku berhemên ku derdiketin qels bûn. Û divya bû ku yê pisporê materyalê bi xwe binivîse û amade bike, lê ji ber ku yê kurdî di der barê materyalê de lawaz bû û yê pispor jî di kurdî de lawaz bû, lewma kar bi awayekî baş nemeşiya. Lê detpêka sala xwendinê ya 2022-2023 û piştî peydakirina hin wergêran nêzî 30 pirtûk û çavkaniyan hatin wergerandin û di vî warî de kar berdewm e.”

### ‘Berhemên nivîskarên kurd ziman û wêjeya kurdî li pêş xistin’



HevserokaHevgirtina Rewşenbîrên Herêma Cizîrê,Anahîta Sîno diyar kir ku nivîskarên kurd xwedî roleke bingehîn e di pêşxistin û parastina ziman û wêjeya Kurdî de û wiha domand: “Di serî de em Roja zimanê kurdî, roja zimanê dayikê li hemû kurdan pîroz dikin. Herwiha keda nivîskarên me yên ku bi zimanê xwe nivîsandine û xebateke berbeiçav di xizmeta zimanê Kurdî de kirine, di warê pêşveçûna ziman û wêjeya Kurdî de, xwedî bandoreke mezin e ku bi saya wan xezîne û piretûkxaneya Kurdî vala neme. Herwiha asta xwendin, nivîsandin û perwerdeyê di gel xwendevanan de baş e û nivîskarên me jî heya astekê pirtûkên gewe dinvîsînin. ji bo parastin û pêşxistina ziman tişta ku ji glê kurd tê xwestin, bêtir xwendina bi zimanê xwe û bêtir nivîsandin e. Herwiha di dema me ya niha de, gelek berhemê kurdî weke stran, çîrok, destan û hwd… yên taybet girêdayî çand û kultûra kurdî, ji aliyê desthilatdaran ve hatine dizîn û kirine milkên xwe ji nivîskarên me jî tê xwestin ku li ser vê yekê bisekinin û ji bo xurtkirina çand û zimanê kurdî.”

### ‘Xwendin bigeha pêşketina gelan e’



Karmendê Pirtûkxaneya Amara Mihemed Selîm Yûsiv jî bal kişand li ser girîngiya xwendina pirtûkên kurdî û wiha axivî : “Armanc ji vekirina pirtûkxaneya Amara, pêşxistin û parastina zamanê kurdî û çandina çandeweriya xwendina pirtûka ye. Herwiha ev pirtûkxane ji lêkolênên xwîneran re jêdereke bingehîn ku berhemên wêjeyî, felsefî, dîrokî û hwd… digire nav xwe hejmara van pirtûkan dighêje nêzî 15 hezar pirtûkî. Di dema me ya nha de, çanda xwendinê di nav civakê de, heya astekê hatiye bicihkirin, lê ji bo ku hînjî ziman bi pêşkeve pêwîstî bi xwendineke bêtir heye. Herwiha ev yek jî pirtûkxaneyan tê pêk anîn, ji ber ku cwendin xwedî giringiyeke bêhempa ye, bange me ji tevaya gelê kurd re jî heye ku bi zimanê xwe bicwînin ji ber ku dema civakek bi zimanê xwe bixwîne wê demê hebûna xwe bi dest dixe, zimanê xwe li pêş dixe û li zimanê xwe xwedî derdikeve.”

# Heyva Sor A Kurd xebatên mirovî yên bêsînor

Heyva Sor a Kurd di sala 2012'an de ji bo peydakirina hewcedariyên tendiruśtiyê yên lezgîn ên gelên Rojava ku ji şerê li Sûriyê bandor bibûn, ji aliyê komek pijîşk û kadroyên tendiruśtiyê ve, hat damezrandin. Di dirêjahiya 9 salan de wê roleke sereke di pêdakirina hewcdariyên tendiruśtiyê yên lezgîn yên welatiyên herêmê de, lîśt, herwiha gelek pirojeyên mirovî pêk anîn.

**Navenda nûçeyan /Qamişlo**

Saziya Alîkariyê Heyva Sora a Kurd ku bi armanca çareserkirina pirsgirêkên gel di 2012'an de li Rojava hat avakirin û li gorî derfetên kêm hewil da ku pêdiviyên tenduristiyê yên lezgîn yên welatiyên Rojava dabîn bike. Heyva Sor A Kurd di demeke kurt de bû mezintirîn destgeha alîkariya tenduristî a lezgîn di tevahiya herêmê de.

Ji destpêka damezrandina wê ve, wekî saziyeke mirovî serbixwe û li gorî prensîbên mirovî tev digere, ango ne girêdayî Xaça Sor û Heyva Sor yên Navnetewî, lê li gorî pêvanên wan tevdigere. Di nav deh salên borî de projeyên herî girîng ku pêk anîne, navenda protez. Projeya jinan a ji bo pişgiriya tendurustiya zayînê û projeya piştgiriya kampan di milê tendurstiyê de.

**Navendên Heyva Sor A Kurd li bakur û rojhilatê Sûriyê**

Li bakur û rojhilatê Sûriyê gelek navend û xalên tendurstiyê yên Heyva Sor A Kurd çîbûn, ji wan Nexweşxaneya El-Hîlal û navenda tendirustiyê ya bi navl Alreşîd li bajarê Reqayê û nexweşxaneya Şehîd Lêgerîn li Til Temrê. Li Minbic û Tebqa 3'ê navendên tendurstiyê yên Heyva Sor A Kurd hene, herwiha piştgiriyê dide beşê jinan û zarokan di nexweşxaneya Minbic û Tebqa de. Heyva Sor xezmeta tevahiya kampên bakur û rojhilatê Sûriyê dike (Kampa Arîşe - Hol - Waşokanî - Serêkaniyê - Roj - Newroz).

Navendeke Heyva Sor A Kurd li bajarê Hesekê li taxa Til Hecerê heye û xizmetên tendurstiyê pêşkêş dike, li bajarê Qamişlo jî navendek mamografî ji bo tespîtkirina penceşêra pêsîrê a jinan heye. Herwiha navendên wê yên tendurstiyê li Qamişlo, Dêrik, Girê Legê û Trebisbeyê jî hene. Di heman çarçoveyê de ji bo rewşên lezgîn nêzîkî 60 ambûlansî li herêmên bakurê rojhilatê Sûriyê, ji Minbicê heta Dêrikê, hatine belavkirin.

**Yek ji serkeftinên Heyva Sor A Kurd**

Yek ji qonaxên herî hesas ku Heyva Sor A Kurd xwe de ispat û roleke girîn lîst, di sala 2019'an de dema belavbûna veyrûsa Korona bû, wê li gorî derfetên xwe yên heyî li seranserî herêmên bakur û rojhilatê Sûriyê bû bersiv û jiyana bi hezran welatiyan ji mirinê rizgar kir, herwiha tîmên wê yên gerok di wê demê bi şev û roj xebateke bê hempa didan meşandin. Ji ber wê yek ji girîngtirîn serketinên Heyva Sor A Kurd di wê demê de bû.

**Astengî**

Tevî ku Heyva Sor a Kurd bi gelek sazî, rêxistin û komeleyên cîhanî yên wekî (Cadus, Medico, save the children, Up, PIN, Samaritan Purse, UNICEF, WHO) re hevkariyê dike, Lê di peydakirina derman û hin alavên tendirustiyê de rastî gelek zehmetiyan tê. Yek ji girintirîn zehmetiyên ku Heyva Sor a Kurd pê re rû bi rû maye, dorpêçkirina li ser herêmên Bakur û Rojhilatê Sûriyê ye, ji ber ku piraniya dermanan ji ber mayîna wan bi demên dirêj li ser sînor, dema fealiyata derman derbas dibe û nema dibe bê bikaranîn. Bi taybet wekî dermanê însulînê ku divê di pilya germahiya 8 de bê bichkirin. Hrewiha kêmbûna çend cûre alavên bijîjkî yên ku hewcedariya herêmê bi wan heye, di nav wan de ambûlansên pêşketî.



Lê Tevî hemû zehmetiyên ku Heva Sor A Kurd pê re rû bi rû ye, lê ew kar dike û hemû pêdiviyên xelkê li gorî derfetên ku li ber destê wan hene, pêk tîne.

**Xebatên Heyva Sor A Kurd bêsînorin**

Heyva Sor a Kurd bi mafên mirovan û mafê her kesî bawere, cudahiyê nake navbera mirovan li ser esasê zayend, kêmendam, reng, ol, bawerî, bîr , kêmnetew, girêdana neteweyî ya etnîkî û temen. Herwiha ji rakirina cudakariya li dijî jinan têkoşînê dike û ji bo pêşketina civakê jî bi erkê xwe radibe. Tevî ku heta niha hemahengiyeke rasterast ya Heyva Sor A Kurd û Xaça Sor û Heyva Sor a Navnetewî re tune ye, lê Heyva Sor A Kurd herdem amade ye ku l her pêngavek ku sûdê bide hewcedaran di warê tenduristiyê li herêmê, ew amade ye. Heyva Sor A Kurd herî dawiyê ji bo vekirina nexweşxaneya şewatê, talasîmiya û penceşêrê kar dike û wê di salekê de naxweşxaneyê veke.

Hêjayî gotinê ye ku Heyva Sor a Kurd di van 9 salên ku herêmê şahidî ji şer û rûdanên bi êş re rekiriye, Heyva Sor A Kurd di rizgarkirina jiyana bi hezrana mirovan roleke serke lîstiye, herwiha ji bo hewcedariyên tenduristiyê yên lezgîn ji koçberan re xwedî roleke sereke ye.

# Pêdiviyên dibistanê ji Komîteya Perwerdê tê xwestin

**Nehîr Pale**

Xebatên perwerde û fêrkarî ji bo civakê xebatekî jê veneger e. Civakê ji bişaftinê diparêz e, bi zimanê xwe fikrandin, hîs kirin û xwe dayîna îfadekirin, dibe ku yek ji rêbazê xwe gihandina Xwebûne be. Fêrbûyîna ziman jî bi riya dibistan û zanîngehan tê kirin. Di vê rewşê de her gundek dibe ku ji wan re derbikeve ku dibistana wan hebe. Perwerde û fêrbûyîn yek ji rêbazên çareseriyê ne. Ji xwe eger her pêkhateyekî bi zimanê xwe bixwîne gelek pirsgirêkên me yên siyasî, çandî, civakî, zîhnî û piskolojîk têne çareser kirin.

Şêniyên gundê Mezrea Rewda jî yê dikeve Bakurê Reqayê û girêdayî navçeya Hezîma ye têkildarî xebatên perwerde û fêrkarî pêdiviya wan bi hinek alîkarî û destekdayînê heye. Ev gund 270 malbatin ku 40 ji wan pêkhateya Kurd in û yên dîtir jî pêkhateya Ereb in. Gundê Mezrea Rewda sala 2002`an hêdî-hêdî avabû ye, hejmara şêniyên gund dighêje 4000 kesî û hejmarek ji malbatan bi eslê xwe ji Kobanê



ne, yê din jî ji Minbic û Reqayê ne. Di van salên dawiyê de koçber jî derbasî gund bûne.

Berî sala 2010`an dibistan li gund tine bûn û zarok ji bo ji dibistana seretayî heyanî zanîngehê bixwînin, diçûn bajarê Reqayê. Ji şagirtan dihat xwestin ku her roj 11 km biçin bajarê Reqayê û heman dirêjiya rê vegerin gundê xwe.

Şêniyên gund sala 2010`an ji gel xwe zeviyekî bi qasî 4 û nîv donimî didin saziya Perwerde û Fêrkarî û wan neçar dikin ku dibistanê ji wan re vekin. Êdî dibistana gund çêbû û zarokan dibistana seretayî heyanî refa şeşemîn li gundê xwe dixwendin. Piştî wê derbasî bajarê Reqayê bûn û xwendina xwe berdewam dikirin.

**DAIŞ'ê dest danî ser dibistanê**

Sala 2014`an de zarokên gund parçeyek ji qurbaniyên DAIŞ`ê bûn. Êdî bi dagirkirina Reqayê re çeteyên DAIŞ`ê dibistan talan kirin û ji 4 odeyên hazir 2 ode dest danîn ser û birin. Ji derveyî ode çi li dibistanê hebû û wê sûd jê bigirin, dest danîne ser.

**Şagirt li dibistana xwe vegeriyan**

Piştî rizgarkirina Reqayê sala 2017`an şêniyên gund bi alîkariya mamosteyan dibistana xwe vekirin. Tenê 2 ode mabûn lê dîsa jî heyanî 2022`an 170 zarokî heyanî refa pêncemîn dixwendin. 4 mamoste (3 mêr û 1 jî jin) û rêveberê dibistanê berpirsyartiya xwendina zarokên gund girtine ser milê xwe. Danê sibehê saet 7:30-12:00 beşek ji zarokan tên dibistanê û saet 12:00-15:30 piştî nîvro beşê dîtir tên.



**Zarok dev ji xwendinê ber didin**

Tenê 2 ode hene, ferehiya wan 4 m û dirêjahî jî 6 m, li yek ji wan odeyan 15 kursiyên dibistanê hene û li ya dîtir jî 8 kursî hene. Danê sibehê û danê nîvro 80 zarok têne dibistanê û li her odeyekê bi qasî hejmara kursiyên dibistanê zarok bi cih dibin. Bi demê re ew zarok jî wê çiqasî bikarbin xwendina xwe dewam bikin, bi guman e.

Têkildarî mijarê Rêveberê dibistanê Omer Hamid El-Hilo anî ziman ku derfetên xwendinê li gel wan kêmin, hem mamoste hem jî ode kêm in.

Hevserokê Komînê Ridwan Elî jî anî ziman ku şêniyên gund êdî hêviya xwe qut kirine û ji zarokên xwe re li riyên çareseriyên ên dîtir digerin.

Mustefa Mihemed Xan ku yek ji şêniyên gund e, diyar kir ku niha 5 zarokên wî li malê ne û nikarin bixwînin.

Mesaheta erdê dibistanê gelekî fereh e, lê pêdivî heye ku dar lê werin çandin, derî ji bona odeyên dibistanê werin çêkirin û pêdiviyên dibistanê werin temamkirin heyanî ku şênî bikaribin zarokên xwe rêkin dibistanê.



# Deng û rengê pêkhateyan di Mihrîcana Orkêş de

**Navenda nûçeyan**

**Bi beşdariyeke mezin a şêniyan, û bi tevlêbûna 30 komên ji Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê, bi dirûşma "Bi dengên pîroz şoreş ava dibin" 2`yemîn Mîhrîcana Mûzîk û Stranan a Orkêş li Navenda Çand û Hunerê ya Mihemed Şêxo a li bajarê Qamişlo dewam dike.**

Bi beşdariya 30 komên Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê û bi dirûşma "Bi dengên pîroz şoreşê ava bikin", 2'yemîn Mîhrîcana Mûzîk û Stranan a Orkêş li Qamişlo dest pê kir.

Di mîhrîcanê de rewşenbîr, hunermend û hezkiriyên stranan beşdar bûn, mîhrîcan li hola Navenda Çand û Hunerê ya Mihemed Şêxo tê lidarxistin. Di navendê de wêneyên şehîd Hozan Mizgîn, şehîd Heqî Kerar, şehîdan û wêneyên Rêber Abdullah Ocalan û wêneyên candina herêmê hatin daliqandin.

Di serî de endamê Tevgera Çand û Hunera Demokratîk a Mezopotamya hunermend Bêkes Darî şehîd Mizgîn û hemû şehîdên tevgera hunerî ya Tevgera Azadiya Kurdistanê bi bîr anîn.

Darî lidarxistina mîhrîcanê li tevahiya gelên herêmê pîroz kir û got: "Armanca lidarxistina vê mîhrîcanê ew e ku çandên hemû gelan ji hev nêzîk bibin, nexasim di rewşeke wiha de ku dewleta Tirk a dagirker hewl dide bi rêya êrişên xwe van çandan qir bike. Ji ber wê jî divê em çand û kultûra xwe biparêzin.

Darî serkeftin ji komên beşdar re xwest û got: "Komîteya nirxandinê ji muzîkjen Reşîd Sofî, hunermend Delîl Mîrsaz, hunermend Serhed û hunermend Mizgîn Tahir pêk tê."

Piştre, hevseroka Meclisa Rêveber a Rêveberiya Xweseriya Demokratîk a Herêma Cizîrê Vîvyan Beho axivî û destnîşan kir




ku bîranîna şehîdan di mîhrîcanên wiha de nîşaneyên diyar û girîng dide ku bi saya wan çanda gelan tê parastin û wiha domand: "Em ji vê mîhrîcanê piştrast dikin ku em dê li hember êriş û siyasetên ku li dijî çanda me tên kirîn bi çand û hunera xwe ve bêhtir bên girêdan."

Her wiha, endamê Desteya Çand û Hunerê ya Herêma Cizîrê hunermend Serhed Zana bal kişand ser erka hunermendan di vê qonaxê de û got: "Îro li Kurdistanê û herêmê bi giştî berxwedaneke bêhempa li hember pergalên dijber di serî de dewleta Tirk a dagirker tê meşandin. Ev berxwedan jî bi saya fikrê Rêber Abdullah Ocalan bilindtir dibe, ji ber wê jî divê her hunermendek van destanên dîrokî û berxwedanên bêhempa bi rêya hunerê belge bikin û veguhêzin nifşa din. Da ku em bibin dengê gelan, her wiha divê em vê mîhrîcanê jî bikin amûra têkbirina siyasetên qirkirina çandî."

Piştî ku peyam hatin xwendin, sînevîzyonek li ser jiyana şehîd Gurbet Aydin (Hozan Mizgîn) û peyamên bi dîmen ên hunermendên Kurd ên 4 parçeyên Kurdistanê û Ewropayê hatin pêşandan, ji nav wan hunermendê Sûriyeyî yê muxalif Semîh Şiqêr jî bi rêya dîmen lidarxistina mîhrîcanê pîroz kir û keda tevgera çandî û hunerî ya Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê silav kir.

Tê payîn ku mîhrîcan 7 rojan dom bike û di dawiyê de komêm serkeftî bên xelatkirin.

Hêjeyî bi bîrxistinê ye ku 2`yemîn Mîhrîcana Mûzîk û Stranan a Orkêş heta 16`ê Gulanê dewam bike.

# Ji ber dorpêçê welatiyekî li taxa Eşrefiyê jiyana xwe ji dest da

**Navenda nûçeyan**

**Berî çend kêliyan welatiyê bi navê Selah Mihemed Hebeş li taxa Eşrefiyê ya Helebê di encama ketina kevirekî ji avahiyên taxê de jiyana xwe ji dest da. Di vê bûyerê de hikumeta Şamê ya ku dorpêça xwe didomîne û rê nade madeyên çaksaziyê derbasî taxên dorpêçkirî bibin, tê tohmetbarkirin.**

Rêbendên hêzên hikumeta Şamê yên li derdora taxên Şêxmeqsûd û Eşrefiyê û kantona Şehbayê ji 9 mehan de dorpêçek giran li ser van deveran dimeşîne û rê nade madeyê sereke wek ard, derman, sotemenî û madeyên çaksazî û avahîsaziyê derbasî wan deveran bibin.

Di encama vê dorpêçê de, welatiyê bi navê Selah Mihemed Hebeş (53) ji ber ketina kevirekî ji avahiyên taxa Eşrefiyê birîndar bû. Lê tevî hemî hewldanan jiyana xwe ji dest da.

Weke ku tên zanîn ji sala 2016'an çeteyên dewleta Tirk a dagirker êrîşî taxên Şêxmeqsûd û Eşrefiye yên Helebê kirin. Di encamê de xesar li gelek avahiyan hatin. Erdheja 6'ê Sibatê bandor li avahiyan kir. Lê ji ber ku hikumeta Şamê dorpêç li her dû taxan ferz kiriye madeyên çaksaziyê derbasî her du taxan nabin. Ev jî xebatên Komîteya Saxlemiya Giştî ya Şaredariya Gel asteng dike.

Welatiyê bi navê Selah Mihemed Hebeş (53) ji gundê Derwêş ê navçeya Raco ya kantona Efrîna dagirkirî ye ku di 2018'an de piştî dagirkirina Efrîna ji aliyê dewleta Tirk a dagirker û çeteyên wê ve bi



darê zorê ji Efrînê koçber bû û li taxa Eşrefiyê ya Helebê bi cih bû. Tê zanîn ku di encama dorpêça giran a hikumeta Şamê ya li ser taxên Şêxmeqsûd û Eşrefiyê de 2 zarok di zivistanê de ji ber tunebûna sotemeniya germkirinê jiyana xwe ji dest da.

# Li Qamişlo sindoqên gilî

**Navenda nûçeyan**

**Yekîtiya Dermansazan a Qamişlo sindoqên giliyan li nav bajêr danîn. Armanc ji vê yekê ew e ku asta nêzîkbûna dermanxaneyan ji nirx û pîvanên yekîtiyê ve bizanin û zêdetir li ser rexneyên şêniyan ên derbarê dermanxaneyan bisekinin ku bi buhayên dermanan dilîzin.**

Şêniyên bajarê Qamişlo bang li Yekîtiya Dermansazan kiribû ku buhayên dermanan bikin yek, di vê çarçoveyê de Yekîtiya Dermansazan 5 sindoqên giliyan li nav taxên bajêr danîn da ku giliyên xelkê û bi taybetî giliyên derbarê buhayên dermanan de, bigirin.

Giliyê xelkê wê bên nirxandin

Sindoq li hember dermanxaneya Ferhan a taxa Xerbî, li hember dermanxaneya Alemiye ya taxa Siyahî, li kêleka dermanxaneya Deham a taxa Kornîş, li kêleka dermanxaneya Îstîqamê ya li Sûka Navendî û li kêleka dermanxaneya Serac a taxa Enteriyê ne.

Hevserokê Yekîtiya Dermansazan



a Qamişlo Kamîran Mejdel Bêk derbarê mekanîzmaya yekîtiyê ya di vê projeyê de got; "Giliyên şêniyan wê bi awayekî heftane ji aliyê yekîtiyê ve bên dîtin. Piştî ku ew gilî tên nirxandin wê ji bo dermansaz bên hişyarkirin. Eger gilî dubare bûn jî wê demê wê dermanxane bê cezakirin. Eger dîsa dubare bibin jî wê dermanxa ji bo 15 rojan bê girtin." Mejdel Bêk destnîşan kir ku kesê ku dixwaze gilî bike, bila navê xwe, navê dermanxaneyê, navê derman û nirxê wê binivîse. Tê payîn ku 5 sandoqên din li navçeyên bajêr (Amûdê, Tirbespiyê, Til Birak, Til Hemîs û Girkê Legê) bên danîn.


# Azadiya fîzîkî ya Ocalan çareserî ye

**Navenda nûçeyan**

**Endamên Delegasyona Aştiyê ya Îmraliyê ya Navneteweyî çûn serdana Buroya Hiqûqê ya Sedsalê û têkildarî tecrîdê agahî wergirtin. Wan got, bi azadiya fizîkî ya Abdullah Ocalan, pirsgirêka Kurd dikare bê çareserkirin.**

ku em nikarin agahiyê ji Abdullah Ocalan wergirin."

Parêzer Sarica jî bal bire ser helwêsta Komîteya Pêşîgirtina li Êşkenceyê ya Konseya Ewrûpayê (CPT) a têkildarî Girtîgeha Îmraliyê û got, helwêsta CPT´ê ya li ser tecrîdê 25 sal in bi heman rengî ye.



Di nava delegasyonê de ji sê welatên cuda 3 kes hatin temsîlkirin. Profesorê Sosyolojiyê û Antropolojiyê Denis O'Hearn, Alîkara Serokê Koma Çep a Konseya Ewrûpayê, Nûnera Meclîsa Parlamenteran a Konseya Ewrûpayê û Endama Komîteya Şopandinê Laura Castel, Wezîrê Karên Hundir û Edaletê yê berê yê Îzlandayê Ogmundur Jonasson doh û îro li Stenbolê bi siyasetvan, nûnerên civaka sivîl û rêxistinên hiqûqê re hevdîtinan dikin.

Heyet destpêkê çû serdana Buroya Hiqûqê ya Sedsalê û parêzer Raziye Ozturk, Emran Emekçî, Îbrahîm Bîlmez û Rezan Sarica ew pêşwazî kirin.

Îbrahîm Bîlmez di hevdîtinê de got, "Tecrîdeke giran li Ocalan tê ferzkirin ku li cîhanê mînaka wê nîne. Li Tirkiyeyê hiqûq ji zû ve hatiye betalkirin. Dema mesele Kurd, Abdullah Ocalan û muxalif in, hingê hiqûq tê betalkirin. Bûye 25 meh

Ji parêzeran Raziye Ozturk jî bal bire ser rola Yekîtiya Ewrûpayê û got, Yekîtiya Ewrûpayê ji ber berjewendiyên xwe, zextê li Tirkiyeyê nake.

**Tirkiriye ji Kurdan ditirse**

Endamê delegasyonê Ogmundur Jonasson jî got, "Tirkiye heta ku di nava NATO'yê de be wê ji kiryarên Yekîtiya Ewrûpayê yan jî kiryareke cuda netirse. Lê belê Tirkiye ji Kurdan ditirse. Haya me jî ji vê heye. Ji ber vê yekê, em bi we re ne, bi Kurdan re ne."

Laura Castel jî got, çareseriya pirsgirêka Kurd bi azadiya fizîkî ya Abdullah Ocalan û piştre jî hevdîtinên ji bo çareseriyê dikare pêk were.

Parêzeran piştre rapora li ser binpêkirinên mafên mirovan ên sala 2022'yan ên li Îmraliyê pêşkêşî delegasyonê kir.

# 14’ê Gulanê Wê Bi Dengê Azadiyê Bê Xemlandin

Di 14’ê Gulanê de wê li bakurê Kurdistanê û seranserî Tirkiyê hilbijartinên perlemento û serokkomariyê dest pê bikin, derbarê hilbijartinan de, siyasetmedarên bakur û rojhilatê Sûriyê bang li gelên azadîxwaz yên li bakurê Kurdistanê û Tirkiyê kirin ku li dengê xwe xwedî derkevin û faşîzma AKP-MHP’ê ji holê rakin.

**Zana Roj/ Qamişlo**

Di 14’ê Gulanê de wê li bakurê Kurdistanê û seranserî Tirkiyê hilbijartinên perlemento û serokkomariyê dest pê bikin. Hikumeta AKP-MHP’ê ji bo ku di hilbijartinan de bi ser bikeve dest bi destgîrkirina rewşenbîr, siyastmedar û rojnamevanên ku dengê rastiyê temsîl dikin kir. Li hemberî siyaseta faşîst a desthiltdariya Tirkiyê, gelê Kurd biryara têkbirina AKP-MHP’ê daye, her wiha biryar daye ku wê Partiya Çepên Kesk ku dengê azadiyê temsîl dike, biserbixe.

Li gorî Lijneya Bilind a Hilbijartinê ya Tirkiyeyê, wê di hilbijartinên Tirkiyê yên 14’ê Gulanê de, 60 milyon û 697 hezar û 843 hilbijêr li tirkiyê dengê xwe bidin. Ji van hilbijêran 30 milyon û 710 hezar û 790 ku ji sedî 50,60 jê jin in. Ji sedî 49,40’ê hilbijêran jî mêr in. Hejmara hilbijêrên ku dê cara ewil dengê xwe bidin 4 milyon û 904 hezar û 672 ye. Hejmara astengdarên ortopedîk û kor jî 989 hezar û 543 ye. Hejmara hilbijêrên yên 75 salî û bi ser vî temenî re jî 3 milyon û 180 hezar e. Dê li 973 navçe û 1094 lijneyên hilbijartinê yên navçeyan bi giştî 191 hezar û 884 lijneyên sindoqan dê bên avakirin. Dê li 421 navçeyan sindoqên gerok bên danîn û hejmara hilbijêrên ku dê li ser van sindoqan dengê xwe bidin jî 6 hezar û 215 e.

Di heman çarçoveyê de rêxistina Human Rights Watch (HRW) bi daxuyaniyekê bang li platformên medyaya dîjîtal kir ku li hember zextên desthilatê bisekinin û planên awarte ji bo dan û standina bi her kiryarekê ku dibe desthilata AKP’ê pêk bîne û bi encamên



hilbijartinê bilîze, deynin. HRW’yê îşaret pê kir ku rejîma Tirkiyeyê serweriyê li ser platformên dijîtal dike û dibe ku ji bo Recep Tayyîp Erdogan were bikaranîn. HRW’ê anî ziman ku desthilatdarên Tirk di vê dema dawî de çavdêriya tund li ser medyaya dijîtal û malperên nûçeyên serbixwe ferz kir, nexasim Twitter û hin platformên biyanî.

Di derbarê hilbijartinên 14’ ê Gulanê û siyaseta dewketa Tirkiyê, her wiha rola Partiya Çepa Kesk di van hilbijartinan de hevserokê Partiya Kesk a Demokrat Luqman Ehmê û nûnerê Partiya Nûjenî û Demokrasiyê Heyfa Mehmûd ji rojnameya me re axivîn.

**`Dîroka Tirkiyê bi qirkirinê hatiya nivîsandin`**

Hevserokê Partiya Kesk a Demokrat Luqman Ehmê da zanîn ku ji bo nirxandina rewşa heyî ya Tirkiyê dive em dîroka wan bizanibin û armanca vê dewletê çi ye em bibînin û wiha got: “Osmaniya nûjen ya dewleta Tirkiyê di fikirên xwe yên dîrokî de her tim li ser qirkirin û neqebûlkirina netewên din dewleta xwe avakiriye. Bi taybet ji bo gelê Kurd bi hemû hêza xwe tavahî rê û rêbazên qirkirinê bikar anî û hîn jî vê yekê berdewm dike, ji ber vê yekê hikumeta Tirkiyê tu carî yekbûyna gelê Kurd naxwaze û wê ji bo tunekirina gelê Kurd tavahî pîvanên mirovahî derbas bike. Çawa ku niha li herêmên Bakur û Rojhilatê Sûriyê rojane dike hedef, mînakên wê jî dagirkirina Bajarê Efrîn, Girê Sipî û Serî Kaniyê ye.”

**`Dem dema têkbirina nijadperest û netewperestiyê ye`**

Luqman diyar kir ku ji bo bidawî kirina zihniyeta qirkirina Kurdan a bi hezar salan, dive tavahî Kurd dengê xw bidin Partiya Çepên Kesk û wiha domand: “Li hember zihineyeta ku bi salan e hatiye avakirin, têkoşîneke gelek pîroz



hatiye meşandin. her çiqas li hember dagirkeriya Tirkiyê têkoşîn û berxwedanî tê kirin, li beramberî vê yekî jî ewqas çewsandin, zordarî û kûştin hatiye pêkanîn. Ji ber wê jî dagirkeriya Tirkiyê (Erdogan) di mayîna li ser hikumê xwe de bi îsrare wê tu carî mijara qirkirina gelê Kurd ji rojeva xwe dernexîne. Li ser wî esasî tavahî gelê me yê Bakurê Kurdistanê ji bo têkbirina zihniyeta bi salan ya li ser kurdan û dîrokeke nû ya gelê Kurd bidin nivîsandin, bê teredud dive gel di hilbijartinan de berê xwe bide Partiya Çebên Kesk. Dema têkbirina ev hêzên nijadperest, netewperest û olperest hatiye.”

**Rola jinê di hilbijartinan de**

Her wiha Heyfa Mehmûd bilêv kir ku sîstema Tirkiyê xwe bi demokrasiyê da ye nîşandan lê di nava wê de tu rengê demokrasî û wekheviyê nîne û wiha got: “Dewleta tirkiyê weke her dewletek Ewropî xwe bi rengê demokrasî û azadiyê dide nîşandan. Di nava sîstema wê de tenê yek reng tê diyar kirin weke dewleteke xwe di kirasê olperestiyê de girtiye, lê di cewherê wê de tavahî cureyên bê exlaqî tên birêvebirin. Dewleta Tirkiyê di aliyê jin de tu rola hebûna wê neda ye, hebûa jinê weke karekterekî vala hatiye destgirtin. Bi taybet di aliyê xebatên hikumet û biryargirtinê de hebûn



û îradeya jinê qebûl nake. Rûxmî ku xwe weke dewletek demokratîk digire dest. Li ser vî bingehî di van hilbijartinan de yekemîn car e ku jin roleke ewqas diyarker tê de digre, bi taybet di nava Partiya Çepên Kesk de rêjeya jinên ku xwe nemzet da ne %41 derbas kiriye. Di dîroka Tirkiyê de ev yekemîn care ku tiştekî wiha tê kirin. Li ser wî esasî rola jinê di van hilbijartinan de rolekî gelekî girîn e, him di aliyê biryargirtinê de û him jî di aliyê guhartina zihniyet de.”

**`Serkeftina jinên azadîxwaz serkeftina tevahî jinan e`**


Nûnerê Partiya Nûjen û Demokrasiyê Heyfa Mehmûd da xuya kirin ku wê her tim piştgiriya jinên Bakurê Kurdistanê bikin û bang li tevahî jinan kir ku berê xwe bidin Partiya Çepên Kesk û wiha axaftina xwe qedand: “Ji Bo tavahî jinên azadîxwaz û kedkar yên ku ji bo azadiya xwe têdikoşin û banga wekhevî û demokrasiyê dikin. Em weke jinên Bakur û Rojholatê Sûriyê heyanî dawiyê piştgiriya jinên Bakurê Kurdistanê dikin. Serkeftina wan serkeftina me tevan e. Ji ber wê jî em banga tavahî jinên azadîxwaz dikin ku berê xwe bidin hilbijartinan û dengê xwe bidin Partiya Çepên Kesk.”

# ‘Jinên endamên Partiya Çepên Kesk dê aştiyê misoger bikin’

**Jinên siyasetmedar diyar kir ku beşdariya namezetên jin ên Partiya Çepên Kesk di hilbijartinan de dê aştî û demokrasiyê pêk bîne.**

14’ê Gulanê li Tirkiyeyê hilbijartinên parlamentoyê û yên serokkomariyê dê pêk bên. Li Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê jî gelek caran bi rêya çalakiyan gelan piştgirî da Partiya Çepên Kesk. Têkildarî mijarê jinên siyasetmedar ji ANHA`yê re axivîn.

Cîgira Hevserokatiya Kongreya



Neteweyî ya Kurdistanê (KNK) Hêvî Mistefa bal kişand ser tevlêbûna jinan û da zanîn ku ew wek jinên li Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê baş dizanin şoreşa ku jin tê de nebin dê bi ser nekeve û got: “Dema civak banga aştî û demokrasiyê bike, pêwîstî bi jinên xwedî rol heye.”

Hêvî Mistefa destnîşan kir ku Partiya Çepên Kesk di hilbijartinên li Bakurê Kurdistanê û Tirkiyeyê de xwedî roleke çalak e, hebûna wan cihê kêfxweşiyê ye.

Hêvî Mistefa bang li gelê Kurd, aştîxwaz û bi taybet jinan kir ku baweriya xwe bi hebûna jinan di nava parlamentoya Tirkiyeyê de bînin, ji ber wê guhertin bi destê wan e.

Nûnera Partiya Nûjen a Demokratîk Heyfa Mehmûd jî da zanîn ku ji ber zîhniyeta dewleta Tirk a ku bi serkêşiya hikumeta AKP`ê, bi salan e rewşa jinan paşmayî ye û jin rastî binpêkirinên rojane tên û hikumet bi zindanîkirin û qetilkirinê rêya azadiyê li ber jinan digir e.

Heyfa Mehmûd diyar kir ku di hilbijartinên 2023`yan de li Tirkiyeyê ew dibînin hejmara namzetên jin ji carên berê bilindtir e, bi taybet di Partiya Çepên Kesk de hebûna namezetên jin ji bo wan cihê serbilindiyê ye. Vê



partiyê derfet daye jinan ku mafê jiyanê bi dest bixin û got: “Ji ber tecrubeya jinan li Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê, hêviya me heye ku li Bakur jî jin guhertinan pêk bînin.”



# Di navbera pejirandin û nepejirandinê de Ketina maskan

**Navenda Rojava ya lêkolînên stratejîk**

Di Rojhilata Navîn de pirsa mafê gelan, mafê mirovan û demokratiyê ji pergala sermayedar re û serweriyên ku di Rojihalata Navîn de desthilatdariyê dikin; xala herî dawî ya ku ne cûdane ji istratejiya dewletên serdest ku bi giştî di nava xêzika sermayedariyê de tevdigerin, ew ji bo sererastkirina pergala cîhanê ku bi giştî dikeve xizmeta berjewendiyên wan de.

Di serdema avabûna Yekîtiya Sovyetê de û bi taybetî piştî şerê cîhanê yê duyem di navbera sala (1939-1945), dabeşî du bilokên mezin bû; cîhana sosyalistê û cîhana sermayedar. Lewra hevsengiyeke di cîhanê de hatibû çêkirin û di navbera herdû bilokan de dewletên di Rojhilata Navîn de siyaseteke hevseng dimeşandin ku hebûna xwe pê berdewam dikirin, ji wan jî mîna desthilata Şamê bi taybet di serdema serokê berê yê Sûriyê Hafiz Esed de.

Bi hilweşîna Yekîtiya Sovyetê di 1991 de, Amerîka weke desthilatdarê yekem di cîhanê de hate diyarkirin, lewra razîkirina Amerîka ji hêla dewletên Rojhilata Navîn ve bi taybet piştî dagirkerina Efganistan û Îraq ê û belavbûna hêza Amerîka di herêmê de, hiştiye ku ev dewlet dibin serweriya Amerîka de tevbigerin û dewletên ji derveyî serweriya Amerîkiyayê rastî sizayan hatine. Metirsiya ji Rûsiya ku bi helweşîna Sovyetê re bi paş de vekişiya bû di salên 2000an de dîsa vegeriya ye û pê re jî Çîn weke dewleteke xwedî aboriyeke mezin li pêşberî Amerîka derketiye. Rûsiya û Çîn di sepandina serweriya xwe de di Rojhilata Navîn û asiya Navîn de, bûne du metirsiyên mezin ji Amerîka re. Amerîka guhdayîna wê li ser Asiya Navîn pir çêbû ye, Rojhilata Navîn jî nema ewqasî jê re giring maye, lewra giraniya xwe avêtiye ber bi Asiya Navîn de ku li hember tevger û têkiliyên Rûsiya û Çînê di wan herêman de rûbirû maye, her wiha vekişîna Amerîka ji Efxanistan û dudiliya wê di mayîna li Îraq û Sûriyê de, di nava siyasetên dewletên Rojhilata Navîn de, metirsî afirandine ku Amerîka nema xwe dibîne parêzvan ji hevalbendên xwe re, lewra dûbare vegeriyaye siyaseta hevsengiyê bi hêzên cîhanî re; bi taybeta (Çîn, Rûsiya û



Amerîka) re, ankû hestkirineke heye ku êdî Amerîka nema ew hêza yekane ye, lewra jî me dît bê çawa Tirkiyê ji dewleteke girêdayî Amrîka dest bi dijberiya Amerîka di gelek waran de kiriye û car caran berûvajî helwestên Amerîka jî tevgeriya ye, her wiha tevî ku Amerîka Îran weke dewleteke dijber dibîne jî, lê belê li ber çavê Amerîka gihişte serweriya li ser Îraq, Sûrî û Lubnanê, ji bilî ku geşedanên buhara ereban û bûyerên li Sûriyê, Yemen, Lîbiya û hin herêmên din, lawaziya siyaseta Amerîkî nîşan dane û rola Rûsiya û Tirkiyê û Îranê bêtir xwe daye pêş. Di dema dawiyê de em dibînin ku di nava dewletên herêmî de bi piştgiriya Rûsiyê ya eşkere û ya ne eşkere ya Çînê, hevdîtin, nêzîkbûn, peyman û hevsengî çêdibin. Mîna maseya Astana (Tirkî, Îran, Sûrî, Rûsiya) ku civînên çar alî jî yên van dewletan ji bo lihevanîna Sûriyê û Tirkîyê berdewamiya Astena ne. Lihevhatina Siûdiyê û Îranî, lihevhatina Tirkiyê û dewletên derdorê û herî dawî jî zivirandina serweriya Esed ji Yekîtiya Erebî re, di demekê de ku Amerîka tevî ku dixwaze xwe weke karîgerêvan pêşketinan nîşan bide û bide xuyakirin ku bêyî wê tiştek nabe jî, lê belê lawaziya siyaseta Amerîkî û hevbeşiya serweriya Amerîka, Rûsiya û Çînê li ser herêmê nîşan dide. Wê demê em dikarin bêjin ku zîvirandina Esed ji bo Yekîtiya Erebî re, lihevhatinên dewletan di herêmê de û paşguhkirina daxwaz û mafên gelan ji sedema van pêşketin û guhertinên di bilindbûn û ketina hêzên navneteweyî de. Ji ber ku dema mirov li van gavên dawî yên Yekîtiya Erebî dinêre û daxuyanî û biryarên wan di derbarê Sûriyê de dişopîne. Tê xuyakirin ku armanc berjewendiyên van dewletan bi xwe ye û ne gelê Sûriyê an jî ferweriya Şamê ye, ew sedemên ku ji ber wan dewletên erebî têkiliyên xwe bi Esed re birîbûn ( kuştina gel, koçberkirin, çekbikaranîn, nepejirandina çareseriyeke siyasî) ranebûne, nexwe çima ewqas rijdebûn li ser ku têkiliyên xwe bi Esed re vegerînin?

Wezîrê karê derve yê Urdinê diyar dike ku sedem ew e ku maseyeke erebî ava bibe û di çareserkirina kirîza Sûrîyê de rola ereban hebe! 12 sal di ser kirîzê re derbas dibin çi hatiye guhertin ku dewletên erebî bi êşa Sûriyê bihisin û wê bigrin nava xwe?

Wezîrên karên derve yên ereban dîyar kirin ku Sûriyê ji îro û pê de dîsa wê endamtiya xwe di Yekîtiya Erebî de bikar bîne? Sûriyê çi gav avêtine ji bo çareseriyê da ku bi lez dîsa ew vegerandine, heger bi rastî armanc dawîanîna li kirîzê be?

Her wiha serweriya Sûriyê, yekîtiya xaka wê, dawîanîna li terorê, derketina hêzên biyanî ji Sûriyê, avakirin û dawîanîna li êşa gelê Sûriyê û vegera koçberan tînin ziman? Gelo wê çawa ev pirsgirêk tev de çareser bibin û rêjîm ew rêjîm e û rikberiyan qebûl nake û ne jî çareseriyên ne weke daxwaza xwe qebûl dike?

Amerîka nerazîbûna xwe nîşan dide û di heman demê de têgihiştina xwe ji mebesta dewletên erebî re nîşan dide! Lewra zîvirandina Esed ji yekîtiya Erebî re daxwazeke van dewletan e. Ji bo berjewendiyên wan yên hundirîn û herêmî ne û xala mafên gelê Sûriyê an jî çareseriyeke neteweyî bi erêkirina hemû pêkhateyên Sûriyê ji derveyî armancan e. Bi giştî geşedan û pêşketinên sîyasî di herêmê de, rewşa pergala cîhanî ya tevlihev û teyisandina wê li ser herêmê nîşan didin, dê tu çareseriyan bi xwe re nayne û kêşeya Sûriyê dê bimîne dîlê lihevkirina berjewendiyên Amerîka, Rûsiya, Îran,Tirkî û Israyîlê. Bê guman dema em wiha dibêjin, pêwist e ku em ji bîr nekin ku di çarenûsa kirîza Sûriyê de rol û vîna gelên Sûriyê bi xwe jî, xaleke sereke ye û ne ji sedî sed girêdayî van dewletan e. Weke mînak pêşxeriya Meclisa Sûriya Demokratîk (MSD) ji bo çareserkirina kirîza Sûriyê, banga ku ji bo hevgirtineke neteweyî û avakirina rikberiyeke demokratîk, xwe dispêre vê gihiştinê ku gel dema xwedî vîn be dikare bibe lîstekvanekî bi hêz û gelek pilanan jî vala derxîne. Di dema îro de rikberiya li dijî Esed wendabûnê jiyan dike û nema cihê baweriyê ye. Ne di asata hundirîn û ne jî di asta derve de, di pêkanîna berjewendiyên Tirkiyê de, bi tenê maye kaxezek. Em dikarin bibêjin ku bi tenê Xweseriya demokratîk maye hêviya avakirina rêkberiyeke neteweperwer. Li gorî vê yekê çendîn pêkhate, demokratîxwaz û xemxurên gelê Sûriyê xwe li dorê kom bikin ewqa hêviyên çareseriyeke demokratîk jî wê li pêş bikeve.



## FENER



### Îro Deriyekî Dojehê Tê Girtin

**Idrîs Henan**

Ger mirov bal bide daxuyanî, axaftin û gotinên aliyên berbijêr li Tirkiyê û bakurê Kurdistanê, dê baş têbigihêje ku hilbijartinên 14’ Gulanê dîrokî ne. Bi vê têgihaştinê hemû alî di nav têkoşîneke bê hempa de ne. Lew re jî; serweriya AK partî – MHP, hemû sazî û dezgehên dewletê di hemleya xwe ya hilbijartinê de bi kar tîne û diçewisîne. Ji bo desteserkirina dengan, pêvajoya qirkirina siyasî daye destpêkirin û bi zanebûn Amed xiste navendê. Bi vê qonaxê re, carek din berê xwe da rêbazên berê û bi girtin, qirkirin, astengkirin û xapandinê, berê xwe daye dekûdolaban û bi hemû hêza xwe hewl dide, bi hîleyan, ewlehiya welêt têk bibe û carek din bibe desthilatdar. Reftarên partiya desthilatê ne dûrî cewherê faşîzmê ne. Di bingeh de, malzarokatiya faşîzmê dike û dixwaze carek din, neo-faşîzmeke mînaka wê nehatiye dîtin biwelidîne. Vê yekê fikarên gelên li Tirkiyê û Kurdistanê zêde kirine û ewlekariya sindoqan aniye keviyeke metirsîdar a desteserkirinê. Tevî hemû hîleyên faşîzma AKP – MHP, nekarî raya giştî bixapîne û çi navendên ankêtan hene, pêşbîniya têkçûna desthilata heyî ya Erdogan dikirin. Ji ber vê xofa ketiye dilê wan, hemû hêza “dewleta kûr” xistiye çalakiyê û ji bo dizî, destserkirin û xesibkirina dengan seferber kirine. Lew re; herderê provakasyon, şer, êriş, girtin û êşkence dest pê kiriye û bi dirindeyiya ku temsîla hovîtiya sedsaleke nû ya qirkirin û tunebûnê bike, êrişî vîna gel ya sindoqan dike. Ji ber vê rastiya desthilatdariya faşîst a Erdogan, pêwîste rikberiya ku nûnertiya vîna gelan dike, hemû hîleyên hilbijartinê yên bi ihtîmala radestkirinê werin nirxandin û tedbîrên pêşwext werin girtin. Ji ber vê zanebûna dîrokî ya Partiya Çepên Kesk, îroj zêdeyî 100 hezar dilxwazên partiyê sindoqan diparêzin. Li rex van hemûyan jî, zêdeyî 3 hezar parêzerên ku wê bi mûdaxele û itîrazên pêwîst li dijî hilbijartinê bixebitin.

Her wiha; divê gelê me, îroj, bi hemû rengên xwe li dijî çi alavên ragihandinê yên desthilatê û çi hewldanên hîlebazî û desteserkirinê hişyar bin. Di heman demê de, ji bona ku rê li ber ajitasyon, êrişên odeyên şerê taybet û şerên piskolojîk were girtin, pêwîste gelê me çi agahiyên di derbarê hilbijartinan de hebin, ji navenda koordînasyona hilbijratinan a fermî werbigire. Derveyî vê yek bila guh nedin ti aliyan û bila baweriya xwe bi serkeftina îro mezintir dibe bîne.

Ji bo parastina nirxên xwe, vîna xwe, pêşeroja xwe, qeder û heyîna xwe, lazime her yek bi vê berpirsiyariyê tev bigere û roja hilbijratina xwe erkdar bibîne û deng bide xwe.

Rê nedin faşîst û nijadperestan û bi hev re pêşeroja vî welatî ber bi demokratîkbûnê ve biparêzin û biguherin.

Hêza bingehîn a guherînê gel e, dînamîka veguherîner gel e, ancax serkeftin bi hişyarî û yekdestiya gel bi xwe be. Ev misyon, ji erka yek beşekî Kurdistanê wêdetir, erka tevayî gelên li Kurdistanê û bi taybet gelê Kurd e. Encamên vê hilbijartinê çi dibin bila bibin, bê guman deriya bihuştê venakin, lê bi kêmanî wê deriyekî dojehî jî bigrin. Lew re; xwedîderketina li paradîgmaya itîfaqa Partiya Çepên Kesek, misogeriya jiyaneke birûmet û azad e.